

ROJA NÛ

Kiriyariya Roja Nû: ji bona erdên Sûriye û Lîbanê, 15 liyên Sûri; ji bona welatên din 2 liyên inglîzî. Bikayê Hejmarekê; 15 Qemerî.

Diwan û gerîmendekariya Rojname: Bêrût-Birc; Weqif Tabet, Telefona Diwana: 74-04; Telefona Mala Xwediyê Roja Nû: 84-41. Edresa telg: Bêrût-Rojanû.

XWEDÎ Û GERÎNENDE: MÎR Dr. KAMIRAN ALÎ BEDIR-XAN

CENG & SIYASET DEWRAN PIRSA ME

Welatekî mezin û dewlemend, erdekî spehî û çeleng, û tê de neh milyon ciwanmêr: eve Kurdistan.

Di nav miletên Rohelatê Navin de, nijadê ko hêj ne gihaye azahî û serbestiya xwe, em in her çend jî em ne kêmî cîranên xwe ne û xelkên ko me nas dikin vî tiştî dizanin û bi sedan ve kitêb û nivîsarên heja, şehdetiya vê rastiyê dikin. Şertê pêgveçûna miletan ê pêşîn bigehîf, azahî û serbestî ye; û tu milet bê azahî û serbestî nikare jî cihê xwe rabe û berê xwe bide warên zanîn, hiner, dewlemendî û serfiraziyê; nikare bi kêfî xwe, bi kêfî cîranên xwe û cihanê bê Carekî, nivî sevankî emerikî, hati bû mala mia dixwest pîrsa Kurdistanê çî ye jî min seh bike. Min xalçeyê ko li erdê bû şanî wî da û jê pîrsî: tu vê xalçeyî çawan dibînî, spehî ye?

Wî got: gelek spehî ye, û mia ye hinde spehî, hindik dftiye. Min gote wî: heke niho, em rabûn û ev xalçe pînc perçe kirin tu çî dibêjî...

Go: hefî e, guneh el.. Min lê vegezarî: Te dît, tu dibêjî qusandîna xalçakî, guneh e welatê me Kurdistan, hatiye pînc perçe kirin, ma ne guneh e min bi ser ve zêde kir û got ê: jî xwe pîrsa Kurdistanê çî ye, te nihû sehkir. Belê, pîrsa Kurdistanê ev e, we latek hatiye par kirin, miletêk hatiye perîşan kirin.

Kurd comerd, ciwanmêr, dil pak û mîrxas in. Xerabiya tu kesî ne xwestine û fro jî na xwazin, xiz met û arîkariya miletên dora xwe kirine û fro jî dikin, û heke firê sendine mezin ketin destê wan, hêj bêtir jî dê bikin.

Lê belê, kurd jî dixwazin bibin xwediyê erd û welatê xwe, û rîya zanîn û hinerê de, avakirin û kokirina cihanê de, bi kêfî xwe û dinyayê bîn.

Miletê tirk, jî şah û padişahên xwe gelek aciz bûbû û ew jî welatê xwe qewirandin û miletên ko dora textê padişahên Osmanî û xelîfeyê misilmanan de, gîha bûn hev û dû, jî hev veqetîyan, her kes para xwe bir, em kurd bitenê jî vê diwana parkirinê destvala derketin; tiştê ko li gora qeydeyên eql û şerîetê, heq û edalet e, diviya bû bikeve destê me ket destên din, em da'wa vî tiştî dikin; eve pîrsa Kurdistanê.

Miletên dora me, gava em da'wa heqê xwe dikin jî me re dibêjin: em hemî misilman in, em hemî birayê hev in, di nav beyna me û we de, tu ferq nîne. Heke ev gotin rast biwa, tiştê ko dikin dîsa ne rast e; jî ber ko gava havek dimire, zaro hemî para xwe dibin û me tu usul e ko brayek rabe û

BER BI SERFIRAZIYE VE

LONDRE— Bombeavêjên britanî di pêşiya peravên Holendayê de, jî nû ve, dirêjî waporên elemanî kirine; sê waporan derb xwarine. Yek şewitiye û xesarine dijwar gihaye didoyên mayîn.

LONDRE— Di rohelatê Stanislawowê de, êrişên elemanî ên xurt hatine paş ve birin. General van Manşteyîn bi qesda parastina Çiya yê Kerpatê, devê deriyê Ewripayê, cehda xwe a paşîn dike. Di nav 24 saetên dawîn de, qiwetên elemanî 15 cara êriş kirine. Li gora gotina elemana, eskerên mecarî jî têkîlî van êrişan bûne. General Martî, di rojnama Deyfl-Telegraf de, dibêje ko, eleman jî Yugoslavya, Ewistirya, Norvecistan, û Denîmarkayê esker kişandine û anîya eniya rûsî; jê pê ve firqeya elemanî a zirhkirî 10, di dora Lwowê de ye. Eleman dizanin ko şerê Lwowê, jî bona wan zehf girane ye, lê jî hindikahiya qiwetan, nikarin, qiwetîne mezin, bişînin vê qada şerî.

STOKHÖLM— Hikumeta fenlandî brersîva xwe şiyandiyê Moskoyê.

CAR HEZAR TON BOMBE

LONDRE— Bi awakî resmî didin zanîn: şevê çuyî jî hezarî bêtir balafirên britanî dirêjî rêhesinêna dora Parîsê, û Ruenê û hejagehên Berlîn û derên Germanîstana Roavayî ên din kirine û lédane. 14 balafir, venejeriyane warên xwe.

Balafirên britanî di vê navê de 4.000 ton bombe avêtine vî hejagehan.

LONDRE— 750 bombeavêjên giran jî tîpê Kelehên Firok Liberatorsan, di pêna 1.250 neçîrvanan de, êrişî kaxeneyên elemanî balafirên, û destgeh û febrîqeyên elemana ên mezin î din, kirine bi awakî gelek xurt lîxistine.

MOSKÛ— Şerê Qrimê her bi xelaska xwe ve diçe. Bi sedan ve neskerên elemanî û rûmanî yê ko xwe kişandi bûn peravên Qrimê ên nîroyî, jî serê zinarên ko hikmî Balaklavayê dikin, hatine avêtin behrê.

Di hêla hêj roavîrê de, eskerîne din dikirin siwarê gomîyan bibin, yê ko tejj bûn, lê ew ketine avê û tî de fetisîne. Şarîstanê Sebastopolê xerabezarek e ko dişewite û jî aliye behr, hewa û reşayîyê dora wê hatiye girtin.

DI CENGÊ SEBASTOPOLE DE

MOSKÛ— Leşkerên rûsî jî bona êrişa asêgeha Malakofê—ya Sebastopolê—xwe Pêk tînin, di şerê sala 1855—an û yê 1942.—an de xuyabû bû ko ev asêgeh miftêya Sebastopolê ye.

WEŞINGTON— Ji sala 1941-î û heta fro Emerikayê 21.000 belafir, 21.000 tang, 1.400 ceng keştî, 500.000 kemyon, û bi milyonan ton pola, û ma'denên din dane Hevalbendan.

TEHRAN— Serekên eşîrekî çar easûsên Mihwerê girtine û teslîmî qiwetên Brîtanya Mezin kirine.

MOSKÛ— Qiwetên sovyetî 2 waporên neyara, her du pev re 2.000 ton mezin bin av kirine û 10 belafirên barkêş avêtine erdê.

NÛ-YORK— Di Japonayê de, şewîr û mişawirên giran tene danîn; li gora raporên ko hatine Japonayê, eleman me biqasî gotînan xurtin, û zora elemana, beriya wextê ko tete bawer kirin, wê biçe.

LONDRE— Piştî ko serekwezîrên erdêan kişwerê Brîtani, di Londrê de, civanê xwe danin, wezîrê Brîtanya Mezin ê Yekemîn Mr. Çorçîl di pêşiya Civatmiletî de, qala pîrsa siyaseta dervekariyê wê bike.

MOSKÛ— Şevê çuyî refên sovyetî dirêjî Lwowê kirine û lîxistine. LONDRE— Kaniyên Mihwerê digotin ko serekdewletên brîtani, sovyetî û emerikanî civankê deynin; Royter dide zanin ko ev nûçe neraste.

BERLİN— Danezana elemanî dibêje ko yekîneyên Ordiya Sor bi xurtî êrişî Sebastopolê dikin.

bi navê bratiyê heqê brayên din bixwe. Gava şirketek tete bela kirin, hisedar parên xwe dibin.

Di qala bav û bratî û dostanî û pardariyê de, isul ev e, mîna ko me gotiye.

Heke bi zor û qiwet e, bi zîlm û zorkeriyê ye; em bi çavê serê xwe dibînin; miletên dinyayê ên zorker digihin kû derê. Niho refên brîtani û emerikanî, hero 4.000 ton bombe davêjin, hesin û agir dibarînin erdê elemana, welatê ko hawer dikir, dikare xurtiyê li cîranên xwe bike, miletên biçûkê bexê nav lepên xwe. Ordiya Sor jî, ordiyên elemana, yê ko gîhabûn heta Stelîngradê, perîşan û şerpeze kirine û ber bişînorên Ger-

QEWIL

Qewilê Şex Ebdilhelîm
Hey dinyayê, hey fenayê
Ka mamûrê xeyra li ser tekyayê
Dinya pûç e, bikêr nayê
Kanî Adem ka diya me Hewayê
Ka nebî Mihemed, bavê Fatimayê.
Kanî baba, kanî dayê!
Ka melayê Quran li ber,
Ka alimê xudanê secer,
Kanî xortê kêm xeber,
Dinya ne ma jî bo pêxember.
Rabe, rabe kamilo rabe
Bênîş giran e, daket ser kabê.
Çûm Ehmediyê, şiklê şamê
Hâr û nûr barî, misla xunavê;
Di dû çavê te çêxî re
Mî tu şex navê,
Mî hewî na be.
Tekya şexê min çî bilind e
Lê dişuxilî, şemal û find e
Sêxê min di qelpê merevê mu' min de;
Mî bi qurbana Hecf Helîm e
Sêxê min, ferxê şahê li Mêrdîn e
Imdad, meded qutbê kamil.

REWİŞA ŞERÎ

LONDRE— Di eniya rûsî de pîrsa Qrimê, bi paqîjkirina vê erdê jî dijîna û ketina Sebastopolê, ya ko karê rojek an didiwaye ber bi qedandinê ye. Ordiya Sor jî aliye din, jî bona êrişîna nû, di axa Mecarîstan û Romanyayê de, xwe pêk tîne û li gora nûçeyên dawîn, eskerên rûsî yê serbestbûyî, jî Qrimê tene rêkirin eniya ko ber bi axa mecerî û rûmanî ve dirêj dibe. Di Ewripa Roavayî de, bombardmanên hewayî bi awakî ecêb giran dom dikin û diwartir dibin. Duhi 4.000 bombeavêj û neçîrvan tîklî êrişan axa Germanîstan, Frensê û Belçîkayê bûne.

Di eniya Birmaniyayê de, japona qesda xwe ne birine serî û leşkerên Hevalbendan di vê eniyê de, êrişên japona sekinandine û li zehf deran pêş ve meşîyane.

LONDRE— Bi vegirtina axa Qrimê, bê şik ketina Sebastopolê jî, îşê roj û saetan e. Ordiya Sor jî nû ve, berê xwe dide eniya Rûmanî; armanca êrişên nû avî Tunayê û kaniyên girazê yê Ploestiyê ye.

WEŞINGTON— Noçavên emerikanî di Pasîfikê de, jî nû ve, 15 waporên japonî bin av kirine.

LONDRE— Nûçegihayê rojnama Deyflî Telegraf jî Zurîxê dide zanîn, hawîrên elemanî yê Berlînê bawer dikin ko êrişa erdê ewripayê, her wekî hewa xweqê, dikare her dem destpê bike; û her wekî der eniya rûsî rewîşa eskerî giran e, li Berlînê zehf hisabê vî tiştî dikin.

MOSKÛ— Leşkerên elemanî di Sebastopolê de bi çavsoyîyê ecêb şer dikin û dixwazin pê birek jî eskerên elemanî ko Sebastopolê de ne, bikarin xwe jê xelas bikin.

LONDRE— Refên Marodersan, yê ordiya emerikanî 9-duhi piştî nîro di Frensê bakurî de li hejagehan xistine; spîtfeyersan ev bombeavêj, di hemandin.

manîstane ve dimeşe; vê Ordiya Sor ko Serfermandarê wî Mareşal Stalin e, ev çend car in dibêje: ordiyên me nobetdarê azahî û serbestiya miletan e, çî biçûk çî mezin.

Zîlm, zorkerî ev dehbe ye ko, bi lepê xwe, gora xwe dikole.

Ev şer, jî nû ve pêş me kiriyê ko zîlm şewî ye, tiştê ko bikare payedar bibe heq û edalate, insaf û insanîyet e. Tiştê ko bi qiwetê şûr hatiye çekirin, bi qiwetê şûrêkî din, tete xira kirin. Dawiya neheqiyê nîne; rîya wê kurt e. Dawiya wî perîşani ye.

Yê ko xwedî heq in, di nîzîngî Xwedê de ne. Xwedê bi wan re ye.

LE JOUR NOUVEAU

Direction : Beyrouth Wakfs Tabet
Place des Canons Tél. 74-04 et 84-41

QUOTIDIEN KURDE

Directeur - Propriétaire: EMIR DR. KAMURAN AALI BEDIR KHAN

Le Numéro 15 P.L.S. - Abonnement
Syrie-Liban 15 L.L.S. Etranger 2 L. Stgs.

KURDISTAN

Le Kurdistan et le Moyen-Orient

Le Kurdistan forme l'épine dorsale du Moyen-Orient.

Il comprend une grande partie des montagnes qui s'étendent de la Mer Noire, à proximité du Caucase, jusqu'au Golfe Persique aussi bien que des plaines fertiles à l'Ouest.

Le Kurdistan est habité par un seul peuple : les Kurdes. C'est une race d'hommes courageux et travailleurs, qui compte plus de huit millions d'âmes. La loyauté, la tolérance, et l'amour de la liberté sont au nombre de leurs plus chères traditions. Depuis l'aube des temps historiques, les Kurdes ont poursuivi leur existence nationale dans leur pays.

Les Kurdes sont distincts de leurs voisins par la race, la langue, et la culture. Ils séparent entre eux les Turcs, à l'Ouest, les Russes, au Nord Est, les Perses à l'Est, et les Arabes, au Sud.

Le Kurdistan qui constitue, à n'en pas douter, une harmonieuse entité géographique, économique et nationale, est inévitablement appelé à jouer un rôle important dans le Moyen-Orient de l'avenir. Il faudrait lui permettre, étant donné sa position stratégique clef entre l'Ouest et l'Est, de devenir une Communauté autonome et, par suite, un facteur politique stable, au lieu d'en faire un carrefour d'intérêts en conflits, ainsi qu'il en est présentement.

En effet, la réaction des Kurdes, là où ils forment de puissantes minorités, aux mesures visant à une assimilation contrainte, a prouvé que tout effort de ce côté pour une solution du problème kurde est voué à l'échec.

Pour les états intéressés ce peut être une certaine perte de prestige que d'admettre qu'ils sont incapables d'absorber la Nation Kurde. Mais il n'y aurait qu'avantage pour ces nations à s'engager dans une voie qui menerait à la transformation d'une minorité gênante en un voisin bienveillant.

Limites Ethnographiques

A L'OUEST : Une ligne partant du Kurd-Dagh (Syrie) et traversant en direction du Nord les régions de Killis, Marache, Albistan et Divrik jusqu'à la rivière Kelkit.

Au Sud-Ouest de cette ligne, on trouve des groupes kurdes dispersés qui se sont établis jusqu'au Golfe d'Alexandrette.

AU NORD : Une ligne suivant la rivière Kelkit et traversant à l'Est les villes de Baybourt et Olty jusqu'à Kars.

Au Nord de cette ligne, des centres kurdes éparpillés atteignent la Mer Noire près de Trébizonde.

A L'EST : Une ligne partant de Kars dans une direction Sud-

Est et longeant ensuite la rive Ouest du Lac Ourmia, le Louristan et la région des Bakhtiars jusqu'à Sehneh et Kermanschah.

AU SUD : Du Louristan du Sud, une ligne traversant du Nord au Sud Khanakin et Kifri, jusqu'au Djebel Hamrin et de là, vers l'Ouest, au Sud du Mont Sindjar jusqu'à l'Euphrate près de Djézireh.

Limites politiques

Avant la première guerre mondiale, le Kurdistan était partagé entre la Turquie et la Perse, avec en outre une petite communauté kurde en Russie. La Conférence de la Paix et les différents traités avec la Turquie, l'Iran, l'Iraq et la Russie aboutirent au partage du Kurdistan entre ces pays. On ne trouve en Russie que 160.000 Kurdes ; ils jouissent avec l'appui efficace du gouvernement d'une entière liberté culturelle.

La bande Sud du Kurdistan Occidental turc fut rattachée au Mandat Français de Syrie.

« La frontière turco iraquienne brisa en deux le cœur du Kurdistan historique. Elle annihila pour de nombreuses générations toutes possibilités d'évolution des tribus kurdes en tant que nationalité » (Encyclopedia Britannica, 14 th Edition, Art. Mossoul).

Géographie physique et ressources

naturelles

Le Kurdistan est surtout un pays de montagnes, mais il compte aussi des plaines et des vallées larges et fertiles. Tel est le cas des plaines de Diarbekir, Passen, Mouche, Kharpout et Djézireh, ainsi que les vallées du Tigre et de l'Euphrate et de leurs affluents.

Le Kurdistan est, en premier lieu, un pays agricole ; il produit toutes sortes de céréales, du lin, du tabac, de l'huile de sésame, toutes sortes de légumes, des amandes, des figes, des noix, des pommes, des poires, des abricots, des pêches, des prunes, des cerises, du raisin, des grenades, des mûres, des olives, etc.

Le pays est riche en bétail et les pâturages sont bons.

Les ressources minérales ont été peu exploitées, exception faite du cuivre près de Diarbekir et du pétrole dans le Kurdistan du Sud. Il s'y trouve en grandes quantités du fer, de l'étain, du charbon, du soufre, du plomb et de l'argent.

Il y a quelques fabriques de textiles et l'industrie domestique est très répandue : Tissage (laine, lin, soie), tapis, travail du cuir, de l'argent, des outils (fer, acier, cuivre).

On y fait un grand commerce d'exportation de laine, de poil de chèvres, de noix de galle, de soie,

de poissons fumés et salés, de fromage, de beurre, de peaux, et de bétail.

Les villes

Environ vingt villes comptent de 30 à 50.000 habitants. Les plus importantes sont :

EN TURQUIE : Diarbekir, Mardine, Kharpout, Malatia, Erzeroum, Erzingan, Mouche, Van, Bitlis, Khozat.

EN IRAN : Saouc eboulagh, Sakiz Senné, Kirmanschah.

EN IRAQ : Suleimanieh, Kirkuk, Zakho, Rawandou, Keisandjak, Arbil, Imadiet.

Population

Aucun essai digne de foi n'a été fait par les Gouvernements turcs qu'Iraniens pour arriver à un recensement exact de leurs sujets Kurdes. Toutes les informations publiées par eux à ce sujet reflètent leurs tendances à minimiser le problème kurde. Les chiffres que nous donnons ci-dessous, constituent une approximation prudente : En Turquie 3.800.000 ; en Iran 3.000.000 ; en Iraq 1.000.000 ; en Syrie 250.000 ; en Russie 160.000 ; soit au total pour le Kurdistan 8.210.000

Exception faite de petits groupes mélangés dans les régions limitrophes, la population est homogène et ne compte que des minorités : numériquement faibles.

Il faut noter qu'au cours des siècles les Kurdes ont entretenu de bonnes relations avec leurs voisins chrétiens, et qu'ils ont étroitement coopéré avec eux dans la résistance aux oppresseurs. Par suite de déportations effectuées sur une grande échelle, on trouve de grandes colonies kurdes en dehors du Kurdistan, au cœur de la Turquie par exemple. Nous n'en avons pas tenu compte dans notre évaluation.

Race et langue

Les Kurdes appartiennent par la race et par la langue au groupe indo-européen. Tous les efforts tentés récemment par les états intéressés pour leur imposer leurs langues respectives ont échoué. Même dans les villes, les Kurdes continuent à parler leur langue.

En Iraq et en Syrie, l'activité culturelle kurde n'est pas interdite. Dans ces pays et en Russie paraissent plusieurs publications kurdes.

Religion

A l'exception des chrétiens et d'un petit groupe qui a conservé un dérivé de la vieille religion de Zoroastre (les Yezidis) les Kurdes sont des musulmans appartenant généralement à la secte sunnite. Mais ils restent pénétrés des vieux principes humanitaires de leur ancienne croyance zoroastrienne, laquelle a laissé chez eux de nombreuses traces. Ils sont tolérants et, de ce point de vue, très différents de leurs autres voisins

musulmans.

Les états intéressés exigent l'assimilation des Kurdes en se fondant sur l'argument d'une similitude de religion. Cependant, le courant prédominant actuellement dans ces pays est un nationalisme outrancier et leur effort pour assimiler les Kurdes s'accroît avec la croissance de leurs tendances chauvines.

Histoire

Il ressort de documents sumériens que, dans des temps aussi reculés que deux mille ans avant J. C. des tribus kurdes occupèrent le cœur du Kurdistan. Guerroyant sans cesse contre leurs puissants voisins babyloniens, hittites et assyriens, ils ne se soumièrent pendant longtemps à aucun conquérant. Ils aidèrent Cyrus à conquérir Ninive et Babylone. Sous l'empire achéménide Perse, ils jouirent de privilèges et se virent confier la garde des temples de Zoroastre. Xénophon, au cours de sa retraite, se heurta à la violente opposition des Kurdes. Ils résistèrent avec succès aux Séleucides. Les Kurdes jouèrent un rôle important sous les Sassanides. Plus tard eut lieu l'invasion des hordes tartares et turques qui couvrit le pays de ruines. Saladin le Grand, le chevaleresque adversaire de Richard Cœur de Lion était un kurde qui unifia la plupart des tribus kurdes sous sa loi. Au treizième siècle encore, les Kurdes résistèrent avec succès aux envahisseurs mongols.

L'histoire moderne débute par l'occupation du Kurdistan par le Sultan Sélim 1er, le premier Khalife Ottoman, qui entreprend ainsi la réalisation de sa politique panislamique. Aidé par l'historien kurde Idriss Bidlissi, Sélim obtint la coopération des principautés kurdes dans sa guerre victorieuse contre les Perses. Cette coopération prit ensuite un caractère permanent par un accord aux termes duquel les princes kurdes reconnaissaient la suzeraineté du Sultan tout en gardant leurs droits souverains à l'intérieur du pays. Dès lors, les Kurdes participèrent en loyaux vassaux à toutes les guerres du Sultan.

Mais l'évolution de la Turquie, d'une confédération de régions soumises à une autorité ottomane en un Etat National, eut une répercussion fatale sur les relations turco-kurdes. Une violation progressive des droits kurdes, dirigée d'abord contre les princes et ensuite, de plus en plus, contre la nation kurde toute entière, a été la cause d'un conflit qui dure encore aujourd'hui.

La première phase de ce conflit à savoir : la destruction des principautés kurdes souveraines, dura jusqu'en 1847. Cette date marque la fin de la dernière principauté kurde qui tomba après

avoir résisté pendant 15 ans aux armées turques. De violentes révoltes éclatèrent en 1879, en 1889 et en 1913.

Après la révolution Jeane Turque les Turques ont accentué leurs efforts en vue soit d'assimiler, soit de détruire la nation kurde.

La nouvelle politique trouve son expression dans des mesures inconnues jusqu'alors; en Turquie, la complète interdiction de l'emploi de la langue kurde et les déportations à grande échelle aboutirent à trois insurrections, en 1925-26, en 1930 et en 1937-38. Elles prirent une ampleur telle que les Turcs furent obligés d'avoir recours à des corps d'armée entiers et à l'aviation.

L'Attitude Internationale

La Grande Guerre 1914-1918 fut une période particulièrement dure en Turquie, non seulement pour les Kurdes, qui périrent en masse au cours des déportations, mais aussi pour d'autres minorités qui furent littéralement anéanties.

Les puissances alliées à la Conférence de la Paix étaient parfaitement conscientes de ce qu'une solution au problème kurde devait être trouvée et la Nation Kurde fut représentée à cette conférence par un délégué, le Général Chérif Pacha.

Le traité de Sévres

Par le Traité de Sévres, qui fut signé le 10 Août 1920, les Grandes Puissances et la Turquie reconnaissaient les droits fondamentaux de la Nation Kurde (Traité de Sévres, Section III, Kurdistan, art. 62, 63, 64). L'article 64 reconnaît aux Kurdes le droit de former une nation et celui d'unifier les différentes parties du Kurdistan.

Mais ces articles du Traité de Sévres n'ont jamais été appliqués.

En effet, les Grandes Puissances ratifièrent par le Traité de Lausanne, le coup de force Kémaliste. Un monde indifférent laissa le

Kurdistan morcelé, proie offerte, aux ambitions nationalistes des états intéressés.

Situation présente et à venir

La pression continue et toujours croissante exercée sur les Kurdes, durant les vingt dernières années, dans l'intention de les supprimer en tant que nation, a abouti à un échec total.

Le seul résultat des efforts tentés pour se débarrasser d'une des plus anciennes nations du monde a été de répandre la misère et la désolation.

A l'issue de la présente guerre mondiale, aucune des nations victorieuses ne pourra rester indifférente à l'établissement d'une paix durable dans le Moyen-Orient. Mais une telle paix ne pourra être obtenue tant qu'une nation, forte et tenace, placée à l'un des points stratégiques les plus importants du monde, demeurera la proie de puissances destructrices, la cause ou le prétexte de conflagrations futures.

Il est difficile de prévoir le stade final auquel mènera la restauration de la Nation Kurde. Mais la première étape de cette restauration ne pourra offrir moins que la réaffirmation de droits qui furent déjà définis, il y a vingt ans, dans le Traité de Sévres. Les Grandes Puissances démocratiques n'ont pas réussi, après la dernière guerre, à empêcher que leurs efforts pour restaurer les kurdes dans leurs droits ne soient balayés par la force brutale et par les intrigues politiques. Ce sont de semblables échecs qui ont obligés les Alliés à reprendre les armes pour la cause de la justice. Et c'est pour en éviter le retour qu'il faut que réparation soit faite à une des plus flagrantes injustices de l'histoire par la restitution au Peuple Kurde de sa place parmi les nations libres.

MIREKA CIHANE

MIRÊKA CIHANÊ MIRÊKA WÊNEYÊN ŞER Û AŞTIYÊ

CENG & BIHINGEH



Brayên me êzedî bi mîrxasî û ciwanmêriya xwe nav û deng dane.

PIRA SEHIRDAR

Qadî di şibakê re nerî, ko çel xulam li ber derî ne; go: baq e, emê bikirin. Pîrê her çel xort, firot qadî û miftî û ji wan re got: ne ma çavê min bardibe; ko ez di berwan re, dakevim herim. derîkî dia tune, ezê tere herim.

Qadî derîkî di jê re vekir û pîrê çû mala xwe.

Qadî ban xorta kir û ji wan re got: hon çî karî dikarin bikin, go ez we bigînim gundê di xwe. Xorta li hev û du nêrin, û ji hev re gotin: te çî ji me ye? Qadî ji wan re got: mi hon kirine.

Xortan jê re got: te em ji kê kirî ne; em hatine cem te şerîete.

Qadî go: min hon ji pîrê kirine. Go: pîrê li fenek di xwe li me kir û li te ji kir, qantirê di me birin û em firotin te. Qadî pîrê qehîrî, tiştê ko pîrê tê kir, go: herin lawên min, malê di xwe, ev îqê min ma, ezê hefya xwe û a we ji pîrê hilînim; ewan xortan ji wî bazarî derketin, û ji bezê çûn heya gundê di xwe û ko li me heram be, em tu carî ne ma tèn wî bajarî.

Qadî karê wî li pîrê digere, di zîqakek teng de, rastî pîrê hat û jê re got: fcar tu ji destê mi xelas na bi, bi destê pîrê girt û bi dî xwe kişand; heya mala

xwe û bir; kîsek anî û pîrê xist wî kîsî û devê kîs girêda û ban hemalekî xwediyê qantirê kir û jê re got: wî kîsî bavêje behrê, û mecidik da xwediyê qantirê.

Xwediyê qantirê ev kîs bar kir li ser qantira xwe û bi rê de ji xwe re got: ev kîs heja ye mecidîkê, ma çima ezê bavêjim behrê, ê ko di hindurê wî de ye, ezê vala kim, bavêjim behrê û kîs ji xwe re binim, bifiroyim. Giha ber behrê, kîs vala kir, nerî ko pîrêk jê diket.

Pîrê çavê xwe vekir, û eşheda xwe anî û ji xwediyê qantirê re got: her mizgîniyê bibe ji lawê min qadî re, bê diya te rahet bû elhcmdi lil-lah, wê xelatek mezin, wê bi de te.

Xwediyê qantirê, beziya û hat cem qadî, û ban kir qadî, go: mizgîniya min li te, diya te rahet bû.

Qadî fehim kir û jê re got; mizgîniya min li te, qantira te çû. Mi ji te re got: bavê behrê, tu hatiyî mizgîniyê didî min.

Xwediyê qantirê veşerîya ber behrê, nerî ko qantira wî çûye.

Pîrê hat mala xwe û mesela xwe hemî ji şeytên re got, şeytên xwe jê diweşand, go ez nikarim wek te bikim, Xwedê min bi agirê, te ne şewitine.

DEMA NIHA

LONDRE—Refine britanî en xurt, ji bombeavêjên giran bihevketî, dirêji axa Germanistanê kirine û bi bajarên Mûnix û Karlsruheê xistine.

Xesarine diwar gihane wan her du şaristanên elemanî. 30 belafîrên britanî venegeriyane warên xwe.

LONDRE—Danezanekê resmî elam dide: bombeavêjên amerîkanî en giran balafirgehên Nansi, Metz û Dijonê dane ber bomban; refine nêçîrvana en xurt ev bombeavêj dihemandin.

LONDRE Wezaretê britanî a hewayî dide zanîn: Şevê çuyî, bombeavêjên britanî, 500.000 bombe avêtine hejagehên axa elemana.

LONDRE—Qerargeha amerîkanî a mezin dide zanîn: bombeavêjên Liberators û Mustangs duhî piştî nîtro likar û barên Pa de-Kalayê en eskerî xistine.

MOSKÛ—Erişqa Sebastopolê a dawîn ber bi destpêkirinê ye. Topçiyên sovyetî asêgeha Sebastopolê bê etlahî bombardiman dikin, û peyadayên Ordiya Sor ji nû ve pêş ve ketine.

MOSKÛ—Li gora rojnama Trud, elemana dest bi vala kirina bajarê Konstanzayê kirine; bendera rûmanî a mezin ya ko 200 mil roavayê Odesayê de ye.

BERLİN—Danezana elemanî dide zanîn ko yekîneyên Ordiya Sor, bi xurtî zor didin Sebastopolê, û erişen wan, ji nû ve destpê kiriye. Li gora vê danezanê karê parastinê pêk tê. Danezana elemanî jê pê ve, dibêje ko yekîneyên Ordiya Sor di Karpat û Dniestra Jorjîn de, bi xurtî ber erişan dikin.

WEŞINGTON—Leşkerên amerîkanî di giravên Marşalê de, Atolê Vjelang standiye.

NÛ-YORK—ji 1ê adarê sala 1941 fî û beta 1- adarê sala 1943. yan amerîkaniyan 20.000 balafir û 25.000 tûng dane Hevalbendan, li ser qanûna qerd û kirê bike. Ji aliyê din, amerîka 598. 718. 657 livre, zad û zexîre rêkirine erdên Hevalbendan. Ji wan zad û zexîran sedî de 45 çûne Britanya Mezin, sedî de 45 Rûsyayê û en mayîn Yewnanistan, erdên Efrîqa Bakurî û Efrîqa Roavayî a frennsîzî.

QEMERZEMAN

Li Kurdistanê, di bajarê Zim-zimanê de hakimek hebû, navê wî Sefê bû.

Emrê wî pir dijwar bû, xelk jê ditirsiyan. Rokê ji rojên Xwedê mielisa wî geriya bû. Sê sihirbendên wî hebûn ji wan re got: fro honê ji mi re binêrin, çî li dinyayê qewimiye, çî ne qewimiye?

Her sê remildar, remlê xwe avêline û bi hewakî nerîn. Ji wan re beyan bû. Yekî ji wan got: go ya hakimê min isal dinya xezeb bariya ye, dinya zehmet e.

Û din got: go ya hakimê min, isal wê xwin biherike, xelk dê bê ne kuştin.

Û sîsiya deftera xwe girt, û tişteke ne got.

Hakim jê re got: tu çima tişteki na bêji?

Go: ê min, tişteke mi ne diyê! Go: na be, l'ê bêji, tişteke ko te di.

Remildar go: ê hakimê min, di remla min de bûye, çî zaroyên ko isal bibin, wê yek ji wan te bikuje.

Hakim go: ev tişteki hêsanîye; ezê emir bidim ser bajêr, heçî zaroyên ko isal bibin, heker keçîk be, ew efû ye, heker kurik be, ezê wî bikuji.

Emir da bajêr, heçî pîrekê wan bi hemil be, hela bê xwe qe yid bike.

Roja ko ji wan re bibe, hikûmet zarokên wan ji wan bistîne, û bikuje.

Zilamek hebû bi emir mezin bû û jina wî wek wî mezin bû, emrê wî heftê sal bû, zaro ne di bûn, di wê salê de Xwedê lawik dayê.

Kesî nizanî bû ko lawik ji wan re bûye. Diya wî û bavê wî dan e gîrî, û gotin ya rebî, heya niha me zaro ne din, isal vê sala xerab, Xwedê ev lawik daye me, heger em bibin ji hakim re, wê bikuje, û heke em ne bin, wê xelkê jê'r bêjin wê me bikuje û wî ji bikuje; a qenc emê bibin nevala şêra hela şêr wîna bixwin, çêtir e.

Bavê wîna rahîstiyê û bi şev birin nevala şêra; danî û hate mal.

Şêrekê me hebû, şeq çeliyên wê şêrê hene; sibehê ji kula xwe derket û nerî, pêçkek insana heye, zarokek tede digîrî.

Çû li ser sekînî û pêşra xwe xist devê wî; û ji çelikên xwe re got: hon li dora min bin, ko tu şêrî din, ne yê vî kurikî ne xwe.

Ewê şêrê ew kurikî xwedî kir heftê salan, lawik mezin bû di nav wan de, êvarê bi wan re diçe çolê.

Nêçîrvanek hebû rojekê çû nevala şêra, ji xwe re seyde bike.

Sibehê carekê di ko şêr ji kula xwe derketin, lawikek di nav wan de ye. Ma ecêbmayî, ji xwe re go: ma ez xewn dibînin an rast e. Çiqa lê mêzand, nêrî ko lawik e, insan e!

Êvarê hat mielisa hakim Sefê û got: ya hakimê min, fro min, ecêbekî hakim jê re got: go çî ecêbe, bêje! Go: ya hakimê min; dît, lawikek di nav şêra de.

Hakim jê re got: tu derewa dikî. Sibehê ezê esker bi te re bişînim, heger rast e, ezê xelata te bidime te û heker derew e, ezê te hebîs bikim.

Go: baş e, mîna tu bixwaz.

Adinê rojê, hakim esker pê re şand nevala şêran, dîtin ko raste şeq şêr û diya wan û lawikek di nav wan de.

Yekî ji wan eskeran xeber ji hakim re anî.

Hakim ji wan re got: go êvarê wextê ko şêr herin kula xwe, hon-agirekî li ber kula wan dadin, wê dû here hundiro, wê şêr hirevin, honê lêwik bigirin û binin.

Ewana wilo kirin, lawik anfa cem hakim, lê nerî got: ev lawik tişki ecêbe, ko em berdayî bihêlin wê xelkê edem bikin; lazim em wîna têxin odakê û em xwarina wî jê re bişînin, nobetçîkî li ber deynin, ji bona ko wî bielimînin şexaliyê.

Xistin odê, nobetçîk li ber danin, alem lê difericin?

Navê wî danî şêr.

Lawê hakim heye, navê wî Qemerzeman e. Sibehê dadikevî ko herê xwendegahî, dît ko xelk li ber oda şêr di fericin, çû cem wan ge; ev çî ye hon lê difericin.

Go: ma tu nizanî bê ev çî ye? go: ez nizanîm.

Go: bavê te lawikek ji nevala şêra arîye; em lê difericin. Go: navê wî çî ye?

Go: navê wî şêr e.

Qemerzeman ji nobetçî re go: derî veke, ezê herime cem.

Nobetçî jê re got: go ez nikarim, derî ji te r' vekim, wê bavê te bixeyide; here izna xwe ji bavê xwe bixwaz, û were.

Qemerzeman çû nik bavê xwe jê re got:

Ya bo, ezê herim cem şêr; ez û wîna emê ji xwe re xeber bidin. Bavê wî jê re got:

Tu nikarî herî cem şêr, lawike. mitwehiş e, ez ditirsim, wê te bikuje; û lawê min ji te pê ve tuneye. Qemerzeman jê re got: go lawik min na kuje, û ezê ewîna bielimînim xeberdanê.

Bavê wî jê re got: here.

Çû ba şêr, hev du maçî kirin, û li cem hev rûniştin, û xwest ko xwarinê ji wan re binin.

Xwarin ji wan re anîn, xwarin û xwest cila jê re binin, anfa; lê kirin û wan li cem hev; sê şeva û sê roja man.

Mielisa hakim jê re got: wê lawê te xwendina xwe ji bîra bike, lazim tu mielimekî binî, hela her duha bielimîne.

Hakim go: baş e.

Mamosteyek anîn ji wan re, her duha dielimîne.

Di vê kêfê de man deh salan; qenc elimîne darsa xwe; û aqilê xwe nas kirine.

Piştî deh salan şêr ji Qemerzeman re got:

Ya Brayê delal, here cem bavê me, izna me jê bixwaz, emê heriue çarçiyê, ji xwe re kêfkê biguherin, hinik bigerin û emê bîn.

Qemerzeman çû nik bavê xwe, destê wî maçî kir û jê re got:

Ez dixwazim izna me bidî me, emê derkevin ji xwe re bigerin.

Bavê wîna jê re got:

Go tu, tuê bibî kefilê. wî lawîkî, ko li kesî nexe, here.

Lawik jê re got: ez kefilê wî, li kesî na xe.

Çûn, ji xwe re geriyana heya êvarê.

Adinê rojê ji xwe re her yekî hespekî peyda kir û çûn nêçîrê.

Di wê kêfê de man çend rojekê.

— Ne qediyê —

PÊJINÊN DINYAYÊ

Xebat - Fidakari - Serfirazi - Serdestî



Ji bergehên axa Kurdistanê; Ibadetgehên Brayên me ên eyzedî.

MOSKÛ—Leşkerên sovyetî di nîro—roavayê Narvayê de, êrişên tang û peyadeyên elemana bi şunda zivirandine.

LONDRE—Di eniya Birmanyayê de, yekîneyên Ordiya Çardehan, xwe gihandine leşkerên Hevalbendan yên ko di Kohimayê de, şêrê japonî dikin. Di nevala Magaugê de, firqeya çîna 38 an a General Stillwell gihaye ava Lankrawê. Di tevayîya eniyan de, refên britanî zor didin japonan; kar û barên gazê yên Wenangaungê derbine giran xwarine, depoxaneyek ber hewa bûye. Çekê britanî ê hewayî, jê pê ve, li Mandelâyê xistine.

ENQERE—Lebatên civatmiletê tirkî duhî ji xwe re civanekî veqar. tt danîne. Tête bawer kirin ko di vî civanî de, qala rêkirina xromê Germistanê, hatiye kirin.

ENQERE—Bi awakî resmî didin zanin: ko ji fro û pêde tirk xrom naştin elemana.